

Helbest



**Serpêhatiya min bi xwendina hestên helbestvan Ismaîl Ehmed û hewla ku helbestên wî bi zimanê kurdî bên xwendin di bawerîya min de giring e û dibe piştgiriyek e berçav ji kesên kurd yên ku bi zimanên din ji bilê kurdî dinivîsin. Ango wergera min ji erebî li kurdî bangek e niştimanî ye ji bo nifşên me bi zimanê xwe me bixwînin.**

**Rêber Hebûn**

**01.01.2022**

Ismaîl Ehmed Evîn kernevalek e xwedayî ye wergerandin: Rêber Hebûn

**Ismaîl Ehmed**

# Evîn

## kernevalek e xwedayî ye



* Wergerandin: Rêber Hebûn

hijmara xelekê 90

# Evîn kernevaleke xwedayî ye
# Helbest

**-Pirtûk : Evîn Kernevalek e xwedayî ye**
**-Nivîskar : Ismaîl Ehmed**
**- Helbest**
**-Wergerandin ji erebî û çêkirina bergê: Rêber Hebûn**

***hemî maf ji nivîskar re parastî ye***

**-hijmara çapê : 90**
**- dîroka çapê : 05.01.2022**

**https://reberhebun.wordpress.com/**

**Ismaîl Ehmed**

# Evîn Kernevalek e xwedayî ye

**Helbest**

***wergerandin ji erebî:**
**Rêber Hebûn**

**Evîn kernevalek e xwedayî  ye- Ismaîl Ehmed- wergerandin: Rêber Hebûn- Helbest**

**Evîn kernevalek e xwedayî ye**
**ronahî têde ji ezmên ve li ser dilên evîndaran de dikeve.**
**Bi wê dînbûn û evîna xwe yên serdemî ji hezkirî re dijîn.**
**Wisa jiyan dibe kernevalek e ji evînê re bi pîrozbahiyek e xwedayî navnîşana wê:**
**evîn nîşana jiyanê ye û pîrozbahiya wê ye.**
**Ismaîl**

# Diyarî

**ji wan giyanên yên min hîştin ku ez bi jor ve di ezmanê evînê, dildarî û dînbûnê de bifirim, carekê bi şadî û bi azariya bîrêkirinê û xwatirxwestinê caran û caran.**
**Ji kesên yên bi rastî min ji wana hezkir û min ji dil hezikirin û heta niha.**
**Ji giyanê bavê min e pakrewan re (Imer),xwedê gora wî xweşke, ew timî jîdera hêza min bû di jiyanê de.**
**Ji diya min e tenik  (Edle) re, ya bê wê min nikarîbû ez berdewam û berxwe bidim.**
**Ji hersê zarokên min re Elend, Alîn û Alav yên dil û giyan û jiyana min desteser kirin.**
**ji hevjîna min e giranbuha re Emîne a ku me bi hevdû re her tiştî parvekiribû di jiyanê de heta peyv jî.**
**Ji we re hemiyan xweşewîst û hezkiriyên min e xwendevan , ez vê berhema dilnizm diyarî we dikim, ji ber hûn çavkaniya yekem in ji hizr û afirandinê .**
**Ji we hez dikim..**

**Ismaîl Imer Ehmed**

# pêşgotin

**Berî hinek çerxan helbestvanê romanî yê kevin gotibû : çêdibe ku heyv ji ezmên bê daxistin bi hevokek e ristkirî..! ev helbesta pêwîstiyê ye, bê em zanibin çima, ev jî Ferensiyê bedew Can Kuktû gotibû.**
**Wisa ez bi Ismaîlê şagirt û heval matmayî bûm, kurê Kobanî û ji Şêranê û ji heriya Hedato a yekem min dîtibû, ew mirnişîna cinawirê helbestê derbas kir , wisa zelal û di rêyên wê ya tije hurikên camên şikestî de dimeşe, bê ku guh bide birîn û xwînên yên ji lingê wî derketibûn.**
**Ew birîn dibin êşek e bi kêf, dibin xweşiya zimanekî helbestî bedewtir û carne û carne jî wisa normal û xweş xuya dikin, lêbelê ligel pir rastî,zîrekî û saw xuya dike lezok, ji ber penaberî û bêhêviya heyînî pir ji xweşiya demê diyarî wî nake, ji bo ku birame û bi kûrahî ew rêbaza ciwaniyê, hestên wê yên li ser agireke gur de dikele, mezintir e ji pêkanîbûnên wanî derbirînî..**
**di helbestên wî de pir dîmen zindî dibin, tenê bîr di hawara wî de tên di kelakela koçberiya wî de.**
**Kobanî,yar xwezî, bêhêvî ,bendeman , xewin û bihna zeyzefûnê, hewil dide ku laşên xwe bi serve hevdû bide, kenê wî ya yekem berve evîniyê, berve straneke windabûyî, berve welatekî li paş eynikan de dijî, helbesta wî wek ku dibêje: nîva wê li vir e û nîva wê ya din li ser stûnên hesretan de daleqandî maye.**
**di helbestên wî de xemên wî yên taybet bi cih dibin, xweya wî ya bi rehnî û herwiha welat jî bi cih dibe, bi şêweyekî tenê em têde dikarin bêjin çendîn tu bedewî Ismaîl.**

**Evîn kernevalek e xwedayî  ye- Ismaîl Ehmed- wergerandin: Rêber Hebûn- Helbest**

**Ey kurê hemî aliyên yên di te de dijîn.**
**Ey kurê elfebaya evîn , şeydabûn û bajarê tî li ser kenarê welatekî birîndar de ku li ser afirandinê asê maye.**
**Kurdistan ew destana a ku bi xwîn û agir afirî, Şêx Seîd, Qazî Mihemed, Barzanî û Leyla Qasim.**
**Ew bihna baxê xwîna şehîdan bihin dike.**
**Şehîdên Kobanî û evîna wanî yê bi axê xemilî, Ismaîl qurtek e tal e ji evînê ,berz dibe, xemgîn dibe, henaseberdan dibe û bi evîna xwe li kêlek xwedê bilind dibe û li wir wê axaftina xweş bibin wek ku ew dibêje.**
**Ismaîl metirsîdar e, dildar e, teşqelciye, hêrsdar e, te nahêle ku tu bihna xwe berdî wek ku di qerebalixê de bibêje ji xwendevan re helbest a min e û ev cîhan hemî a we ye.**

**Hisên Mihemed Elî**

# Keça  sibê

**Keça roniyê**
**min dixwe**
**bi xweşiyek e windayî**
**wek ewrek e li ser kenarên bendemanê**
**bicihbûye.**
**Min diêşîne**
**wek tariyekê**
**bi xwe dikare**
**min berçav dike**
**û di dema baranê de**
**min tîne bîra xwe**
**ji xemê xwe şerm dike**
**û min vedigerîne zelaliya hemdemî**
**cih bi gotinên şehnaz**
**û maçên şehnaz**
**û ewrên baranê**
**dagirtî ne**
**roniya kesk di pencereyê de**
**wê hevdîtins me  derengî nexe**
**û fiskîniya peyalan**
**ji hundirê kezebê**
**tu keça hemî şevbûhêrkanî**
**û hemî sibehanî**
**ez kole me**
**di vê rawestgehê de**

**û find ne rûxirab in**
**ji evînê re dibûn elfebayekê**
**wê nepeniyên wê nikaribe  veke**
**di tovê jiyanê de**
**ji roniya çavên te de di her sibehê de**
**ji te hez dikim**

# Di aliyek e din de

**Di aliyek e din  de**
**ji felekek e kêm**
**min te weke xewinekê şêwe kiribû**
**li ser lêvên gulan de**
**min te weke gewherekê**
**li ser dîwarên hêviyê dîtibû**
**te jiyana min nemir kiribû**
**giyana wê li ber rehniyê de**
**ber bi çepê berve pêşveçûnê**
**û berve rastê berve şadiyê**
**li ser germbûna destên te**
**berî ketina wê di tengala evînê de**
**hêrsdar im mest im**
**û di cihê perestbûnê de**
**ez lehî me**
**kêr  in di berbanga dilan de derbasbûn**
**peyv û peyv…**
**li vir ez gazinda sihwaneke ne diyar dikim**
**dema  finda dil di nav destên te yên**
**ên bi xwîna kesk xemilîbûn  vemirî**
**mîna bêbextiya kujer.**
**Wek dînekî ez digerim**
**li ser cadeya peyvan**
**û li vir ez bîranîneke winda dikolim**
**li paş rojekê ne hatiye hilat.**

# Rû û ewrekê

**Li ser riwê wê de**
**ew ewreke barandî bû**
**û volkanekî ji peyvan bû**
**li ser sînga min de ye**
**li bendê roniya çirûsîna wê ye**
**ta ku biteqe**
**min li ser gelek ramanbûnan dixwend**
**û min jêre ji her ewrekî sirûdekî li ser rêbazên sofiyan**
**û laveyên wan çêkiribû**
**min jêre ji giyanê xwe re peyalekî dagirtibû**
**ji derveyî barana hêsiran**
**lêbelê wisa ma**
**li benda buhareke din**
**dibe ku heta salek an deh salan be**
**an çerxekî ji şîrovekirin û zehmetiyê be**
**û li ser gava bîrêkirinê de di hundirê xwekuştinê**
**ezê li bendê volkana wê ya dijwar bim**
**ji hemî hevokên dînbûnê**
**tenê ew wê bû**
**wê bimîne agirekê di pûşê de**
**ji te hez dikim**
**tevî dirêjbûna ceng û  agirdanê**
**tevî yaseyên fêlbazî û siyasetê**

**ezê te navnîşaneke kesk li ser hemî yaseyan de binivîsim**
**tenê  hindikekî em bêdeng bin**
**belkî ew keser bi dawî bibe**

# Berve bê

**Berve bê kena min e yekem diçe**
**berve avek e birîndar**
**berve evînê**
**berve straneke windabûyî**
**li ser lêvên derbasbûyan**
**berve welatekî li paş**
**di eynikan de dijî**
**paş bendemanê**
**paş xewinek e bi dilekî birîndar**
**şehîd ketî**
**û bêdengiyek e ji gêjbûnê derketî**
**li cem çargoşeyên rêvebirinê**
**ji gulan vala bûye**
**li vir buhar û dilê kesk û zeytûnê**
**li vir hezkiriyên min in**
**li ser ropela te yê sipî de**
**rêwî diçin**
**ligel hêviyeke bi peyvan nûgîhayî ye**
**li xewinekê bi  xweziyan ve ronî bûye**
**û keçkaniyekê di navbera dihû û îro de**
**windabûye**
**ezê bi te   biqedeim**
**tevî lehî û gircirê**
**tevî genima  belavbûyî li ser davekên heftem de**
**tevî xeinqandinê**
**tevî ewê xendiqî**
**ji ber tu  ê ji min re tablûyek e gulgulî de nîgar dikî**
**li ser cejina evînê hatiye danîn**
**ta ku ez wînim di bîr**

**ku ez hînê dijîm**
**ji te hez dikim**

# Ji min dipirse

**Ji min dipirse**
**û di tengalê wê de hezar pirs maye**
**kanî ew xweda?**
**Min xwendin dide**
**eyazek e ji evîna wê**
**û ji bêdengiya wê hêrsekê**
**li jorî mîna meyekê derbas dibe**
**û nalîn mîna dengbêjiyekê pêxweş tê**
**kanî ew xweda?**
**Digot : û li ser sînga xwe xistibû**
**deryayekê diyar dibû**
**ji nêfka malzarokan**
**û girî û girî**
**kanî ew xweda**
**ewr xwe mijand**
**ji xewina wê keserekê**
**û di deştê de**
**hol tîrêj dan**
**hesret û razîkirin**
**ji min pirs dike**
**û di gewriyê wê de**
**şahiya pêxemberan mirîbû**
**û hertimî dibêje**
**kanî ew xweda?**
**Ji awirê xewinekê**
**robarên wê rabûn**
**û rojhilat ji zelaliya helbestê**

**di çavên wê de strand**
**buharek xwe  nêzî henasan teva dikir**
**li ser axê**
**û tîrêjeke ku ji dilê  demê armanca xwe distîne**
**û her timî dipirse**
**kanî ew xweda?**

# Gustîlkekê û qetek caw

**Di destên min de gustîlkek e**
**û qetek caw  e**
**bê reng e**
**û bê bost e**
**ew gustîlka bi  rengekî sermedî ye**
**bostê wê mîna rokê ye**
**dema diya min li ser wêranbûna malê me yê li kobanî digrî**
**rengê xwe û çirûsîna xwe yê wek rokê**
**bi carekê winda dibe**
**û dema ez birîna xwe digrim**
**bi qetek caw ez disekinînim**
**têde bihna kobanî ezber dikim**
**û birîna  min bisekine**
**bermayên êşê li ser maseya bîranînan**
**dimîna xwînçûyî**
**heta ku ez carek e din te bibînim.**
**Bi  helbestên xwe li  ber guhê min**
**tu dibêjî**
**û ez jî bi te xewin dibim**
**de were**
**bila qetek caw di konên penaberan de**
**li ser sînora welêt de**
**me bicivîne**
**bila em bi gustîlkekê bên girêdan**

**li ser kevîka xewinekê**
**wê hema pêkbihata.**

# Xwîna min

**Xwîna min pirtûkek e reş e**
**û zimanê min   neqşeyek e agirî ye**
**û welatekî li ser kevîkekê ye**
**birînek e hemdemî ye**
**û qêrîn dirêj dibe**
**û qêrîn dirêj dibe**
**ez kîme**
**ez kîme**
**û hêsir di çavan de digrîn**
**û ez jî digrîm**
**li ser xwîna min e hatiye rijandin**
**bi zorê**
**bêdengiya min piştî qêrînê bû stran**
**bû helbest**
**bû qeyran**
**em bin sihwanê wê hezar carî dimrin**
**û pirs dimîne ez kî me**
**û çima ez**
**û welat di gewriya helbestê de dimre.**
**Di her carê**
**piştre ez**
**herzar carî**
**û roj bi me derbas dibin**
**û xwîna reş neqede**
**û ne ez jî**

**û ne ew êşa bi lanet**
**di xwîna min de**
**dema ez dimrim.**

# Bendeman

**Bi heft  ziman û darekê**
**li hêviya temam**
**û li ser xewina geliyan**
**li benda te mam**
**û li ser dengên çivîkan**
**ew henaseberdan êşa wî zuha bû**
**û awaza dilsaziyê gurgana wî heliya**
**li benda te mam**
**dema rehnî tenahiya xwe vêxistibûn**
**û biyaniya xwe berve rehniyê**
**û rengên wê yên rengîn li ser nalîna davekê**
**li benda te mam**
**û li benda te mam**
**salên mirin û aramiyê**
**û awaz li ser hêsirên êşan de dixwîne**
**di xurtaniya ava zelel de.**
**Ez li benda sîpera te mam**
**dema bilindiyan difirînê**
**û bilindî rêya nemiriyê dixemilîne**
**û li benda te mam**
**li ciha ku**
**ku evînê**
**ku buharê**
**lêbelê…**
**te fermana yazdan têkbir**
**û tu nehatî**
**û ez wê kêlîkê mirim û heta niha..**

# xwe di nerîna xwe de rast bike

**Di nerîna xwe de wek çirayek**
**û çeng û geliyekê rast bike**
**û li ser xêzan de**
**tariyê bi kelecan bike**
**deng digrîn**
**û li ser min de wek gerestêrkêkê**
**bi kel û girî  bibare**
**bi meyê min   ve serxweş bibe**
**xwezî ku dil têr evîn biba**
**li ser dildariyê**
**di her şevekê mijolbûyî de digrîm**
**li ser dînîtiyan de digrîm**
**wê çawa piştî êş û zorê rastî te ez bêm**
**xwezî girî min mest kiriba**
**xwezî qêrîn û nalîna min**
**di goran de**
**jê yarê re bibana  aheng.**

# Evîna kevinbûyî

**Bi evîna kevinbûyî**
**em sond dixun**
**û dema nimêja berbangê dikin**
**li ser peyalan de ..**
**baxê yasmînê diweşînin**
**di her evînê de**
**em silavan li ser sêwî û belengaz dikin**
**ey dîlberê**
**ey rêya dilsoz**
**were em nimêjê**
**ji evînadaran re bikin**
**lava ji bo wan rengê çirayan dide deryayê**
**were em meya rojîgirtiyan**
**vêxin**
**ji te hez dikim**

# Ji te hez dikim û bêhtir

**Min wisa  bê heyîna rokê  nekuj e**
**ji ber ku li ser her gorekî biyan de**
**hezar stran ji deryayên heftan ve peyda dibe**
**û li wir jî**
**sirûda şevê ji giyanên me yên nemir e**
**bi tewandinê awaza jiyanê distre**
**emê li vir rizgar bibin**
**û li vir**
**wê kobanî bêhtir bijî**
**û li vir jî**
**ezê girnijîna xwe ya penaber li ser gorên çîrokan de xêz bikim**
**de were destê min ramûs e**
**berî tu min bikujî**
**ey penaberê şeytanî**
**di reşiyê nebûyînê de**
**hemî rê di çavên te de**
**ji dilê min  re**
**vekirî ne**
**û di çavên min de aram in**
**wê ji nû ve hilat bibin.**

# Narvînekê riwê min desdan dike

**Narvînekê riwê min qest dike**
**birînên derbasbûyî ne**
**sirûd in an girêdana bîranînan in**
**di pêla pazdayî de**
**ewê xwe bi ser te dirêj dike vehesî ye**
**li ser rêyên destpêkê de**
**şiyar dimîne**
**ez nalînê nagrim**
**wê dibînim**
**distre**
**û li vir tu yî**
**yê deriyê êvarê dide**
**bazdayî**
**ey nediyar ji şiyarbûna min ve**
**ji te re rêyên min in  asê**
**li ser yek rêyî nere**
**paş ewrekê tarî**
**dibe ku di dîmenê de**
**bê êş be**
**cihê xwe di dilê min  de bigre.**

# Dem şkest

**Dem şkest dema tu çûyî**
**dem şkest li ser feleka genî**
**nimêja xwe bê reweşt**
**ditirsyabû pêkbaniya**
**û dem şkest**
**dem hêsir herdû kuştin**
**û rok bi aramî çû ava**
**dem şkest**
**bê ku em wate**
**an reng nîşan bidin**
**aram bû**
**biderbekê rabû**
**pişt re raza**
**bê bendeman**
**û dawî**
**ew evîna yê mirov sax û mirî dike**
**dem ji xwe re nemiribû**
**û teng jî dereng strandin**
**û ne welat jî**
**xwe tevlî hembêza westiyan dikir**
**ji bilî min**
**hêdî be**
**ew narvîn e!**

# Çivîkvedana evîndarekê

**li wir**
**li cihê ku tu têde dimînî**
**û zimanê me yê  çûyî ji peyvan**
**leylana evîna te ji wir de**
**peywendî bi min re dikir**
**û çiyayê xwe bi rengê çavên te pêçandine**
**tiliyên te ji heyvê re**
**bedewbûnên hevokan**
**di odeya helbestê de saz kirin e**
**gulek e sor bi rengê xwînê**
**birînên xwe nebûn**
**zuha nebûn**
**xwinekê wek e bilbilan çivîk nedan**
**di ezmanê cih û waran**
**û zarokekî ji pêsîrê jiyanê nemêt**
**tu welatê minî**
**welatê min**
**bi hemî aliyan bi te de**
**dijîm**
**li wir tu yî**
**ziman û kenên min**
**sirûd û maçê min**
**û deziyên rehniyê**
**li ser lêvên bîranînan**
**û li wir jî**
**tu giyanê min î**
**û darekê bi çil awazanî**
**tu li wir î**

**li benda min be**
**li cihê ku têde hevdîtin**
**û soza me bû**
**ji te hez dikim**

# Bi te diramim

**Bi te diramim**
**mîna şuşeyek e bihin**
**li ser lêvê hêviyê dihele**
**wek e bedewekê**
**li ser vedenga xweziyan de diraze**
**xewinên min bi te re sema dikirin**
**di nav nermiya evîndarekî**
**lehiyê bîranînan di bîr tînim**
**bi peyalek e şeydabûn**
**û bidawîanîna helbestekê**
**şev çavên xwe girtibûn**
**û bendeman bûn e mîrnîşînên hêsiran**
**û hinek ji dîmena keskesorê**

# Girî

**Girî dirêj bû**
**şeva buhirtî**
**û  qêrîn jî**
**nivîn bi zimanê hembêzkirinê husteye**
**hinek ji baranê  bes dike ku em xeydê xwe rakin**
**di malzarokên elfebayê  me yê koçber**
**rêyên xwar**
**zengelorên rêwiyan**
**û jihevketina peyvê**
**em bi avekê bindest  in**
**ji sêwirê evîndrekî netewperest**
**li ser piştê stranekê**
**ezman bi ken e**
**di van kêlîkan de**
**û ez li ser dengê xweziyan de**
**parsê maçek e dîn dikim**
**ji welatekî têde tozên şkestinê bi cih bûye**
**girî xemilî ye**
**bi hatina te berve rokê ve**
**de were em li avê ku ji rehiya bîranînan de tê bigerin**
**yara min**
**ez naxwazim bê bihane bimrim**
**tenê em xwe ji maçeke windabûyî re bitewînin**
**di navbera du eniyên ji çarenûsa hevbeş**

# Çar sîper

**çar sîper di ezmên de**
**di vê şevê de firîn**
**li şehnzaiya xwe ya winda digeriyan**
**di navbera davekên heftemîn**
**û sêwira windayî**
**di xewina min e qutkirî**
**narvîneke jihevketî**
**li ser balkona çîrokan**
**xweziyên zelal**
**stranên rojhilatî**
**rêwî diçin**
**di kûrahiyên helbestê de**
**li ser kevîkên giravê**
**li bendê dimînim**
**awazek e ji deryayên heftemîn tê**
**û ji davekên heftemîn**
**li benda hêviyekê nû dimînim**
**li ser maseya narvînê**
**li benda gemiyek e fînîqî dimînim**
**li ser kenaran de radiweste**
**bê ku bihna koçberan rake**
**ez li bendê xewinekê dimînim**
**di navbera xalên derbasbûnê**
**û cadeyên stranan de**
**windayî maye.**
**Bi peyvên ku ji dîrokê re**
**ji xwe hatin e nivîsîn**
**bi navê te buhaya min**
**li benda hêviyek e ronî dimînim**

**ta ku vegerim welêt**
**li ser zendê xwe sîmfoniya bîrêkirinê radikim**
**û jê re rojbûneke nû di hinavê gerdûnê de bukînan dikim**
**ji helbesteke wê**
**ku derbaskeran li ser guwdehê min de**
**danîbûn**
**heta kevîkek e din ji rojê**
**dibe ku hemî qumplo**
**diyar bibin**
**û dil ji nû ve şîn bibe.**

# Kobanî û ez

**Kobanî  mîrnîşîna min  e  baş e**
**keça rojê ye**
**li ser riwên jiyanê**
**bi awazek e rojhilatî xwînbûyî**
**hatiye rêzgirtin**
**bi me hemiyan tê**
**ji tiliyên wê**
**nalîna Reşîd Sofî**
**û Miço Kendeş**
**û Baqî Xidû tê**
**û keça wî ya  bexçevan**
**yê ez sotandibûm**
**û peyvê wê û dînbûna pêşveçûnê**
**li ser deşta narvînek e ketî**
**û min gelek dikuje**
**Kobanî..**
**were ji kûrahiya xwinên me carek e din**
**ez mîna te me**
**tu mîna minî**
**li paş sînora welatekî**
**di berbanga helbestekê de**
**bi cih bûye**
**bang li me dike bi tîpan**
**û di dilê min e belav dike**
**hezarên ji deryayên bîrêkirin û azariyê**
**Kobanî tu ez im**
**û hemî kernevalan piştî te diçin..**

# Ji ku tu  hatîrêz

**Tu ji ku hatîrêz**
**û li kuve tu diqedî**
**berbanga te tariye**
**û sînga te agir e**
**û helbesta te ji kûrahiya deryayê ve derketiye**
**ta ku bimîne bîranîn**
**li ser laşên me yî şewitî**
**tu ew felekê nerize**
**û berbang nehatî hilat dimîne**
**û helbest dimîne**
**li ber guhên nifşan**
**û lehî kokê perweran di feleka zîro de radike**
**û tu  ji  min hatîrêz**
**ta ku tu  demek e dirêj bimînî**
**dengê xwe ji bê û volkanê re  nimz bike**
**gewrbûna dîrokî  bi dawî nabe**
**li cem xalek e reş**
**bi nan û gengazan kil bûye**
**dema serdema me bimîne serdema nemiriyê**
**tu li vir î**
**taku tu pirsgirêka me**
**di kûrahiya jiyanê de binivîsî**
**ta ku nifş  beşbir bikin**
**û ji nîveheyvê  re pêlan bişîne**
**û tîrêja rehniya xwe ya cihan ji dilên me re bişîne**
**û hilatbûna elendê  bike ji me re mizgînî**
**piştî dirêjî bendemanê**
**û helbest bibe stran**
**û me  fêrî wateya azadiyê bike.**

# Vedengên êşê

**Gelek in ew pencereyên girtî**
**di riwê rokê de di warên min**
**fereh in eww rêyên di navbera welêt**
**û ew welatê yê me**
**di kûrahiyên xwe de**
**dema dûrketinê rahijtibû**
**xemgîn e ew dayika yê rehjenên dilê xwe**
**bi nûçeyê pêlê pîvan dibû**
**ewê ku giyana xwe**
**li ser lepên nalînê hilgirtibû**
**ew bedew e**
**dema nameyên min bêdeng dixwîne**
**û ew dawîpeyv pîvanbûyî ye**
**li ser deryaya bîrêkirinê**
**biyan  im ez**
**di navbera welêt û warên bêdengî û pencereyên asêkirî**
**ne ba di hundir de ye**
**ne roj**
**û ne ez**

# Penaber

**Kurd im**
**sindûqa jiyana xwe dirajim**
**li ser milên xwe ve**
**û bar dikim**
**li rok, av û bê digerim**
**ta ku ez çirûsîna germahiyekê bi dest xwe xînim**
**ji buxçeyên sirûştê**
**ta  ku ez hindek kêlîkan**
**di hembêza azadiyê de bijîm**
**sondekê ji derveyî bask û têlan ve dûbare dikim**
**di welatekî de**
**ji min re navnîşanek e nû dinivîse**
**ta ez navê xwe ji windabûnê biparêzim**
**paş perdeya dînbûnê diçim**
**diçim li aramiyê**
**ji zimanê  binemalan êzingekî ji hêza xwe çêdikim**
**û derbas dibim**
**paş  cihên mizgîniyê**
**û sihên buharê**
**ji genimê çeman ve**
**ez tîpên nû çêdikim**
**di deryaya peyvan de çedikim**
**û bar dikim**
**ji evîndaran re helbestan dinivîsim**
**ji wan re di destpêka elendê de ji derveyî zimanê sînordar**
**tê xwendin**
**bîrêkirinên me tarûmarkirî ne**
**di feleka talîzok û xwebîniyê**
**û lehî ji girnijînên tenahî û  devavêtinê tên**

**ez yê ku timî bar dike**
**paş perdeyek e dîn**
**paş zivistanekî xemgîn**
**paş narvînek e qayim**
**ji barkirina xwe**
**ropelan diafirînim**
**têde hestên xwe yên binaxkirî dinivîsim**
**helbestekê bi zimanê tunebûnê .**
**Û payî li ser çarenûsa xwe bêdeng dimînim**
**û biyanî li ser çavên min bi serdikeve**
**û diraze**
**di deryayê xewin û peyvan de.**

# Li vir

**Li vir**
**malekî  gundî ye**
**jibîrbûyî ye li ser kevîkên felekek e**
**derbasbûyî de**
**û li wir darek e tazî**
**bê nav û bê sih e**
**û bê berhem e**
**li wir jî ji aliyek e din ve**
**girekî biçûk e**
**li dor wê de bermayên felekê kom dibin**
**çengên wê şikestin**
**li der bilindiyên bêhêviyê de**
**û ji paş wê ve**
**şikeftek e aram heye**
**bi tirs , efsan û dînbûnê**
**ez naxwazim niha wê bînim ziman**
**ji ber ku keça min hîn bi şîr e**
**û ez hînê  lê digerim**
**li cîgehekî aram**
**di vê malê de**
**perwînek e bitenê**
**li bendê çi mîvanî ye**
**an çi serdanê ye**
**an çi dînî ye li jiyanekê digere**
**vala ji dazên hezkiriyan**
**wek min**
**di ezmanê min de car caran şêwe dike**
**û li paş  û pêşê min de**
**wêneyên bi ken şêwe dike**

**ji min re tiştê maye berz dike**
**germahiyên hevdîtinê min**
**tîne bîra min ew xewindarê**
**bi pirtûk û regezên min**
**û jiyana min ê yên ez nejiyam e**
**ceng, tirs û gefxwarinê**
**û maçên  fetisî**
**ji riwên wê yên civilî**
**bi hovîtiya kesên yên jiyana me bi rêve birin**
**li gor elfebayekê**
**têde nîşan nîne**
**wîne bîra min**
**ku ez bi navê xwe dijîm**

# Ne kes

**Ne kes tehlî damin**
**an di sîngê min de**
**volkanek e sar veda**
**ji bilî ew kesê ku ji min re got**
**tu ez im**
**û ez pê bawer bûm**
**dema ez ne tiştek bûm**
**û ne ew ez bûm**
**felek zîvirî**
**û bingeh hêdîka berz bû**
**her kilekî di çavan de ez bûm**
**hêdîka hate xwarê**
**her hêsirekî di çavan de ez im**
**ey xwedanê xatir**
**tu ne ez im**
**tu ne şikestî yî**
**lêbelê tu bi hembêzkirinê ketî**
**tu ew lawazî û porsipîbûnî**
**bedew be rojekê**
**ne bêhiş be**
**ez li vir im û ezê bi evîn û dil**
**bilind bimînim**
**bedew û perwer**
**bê zor û zehmetî**
**evîn bilindiye**
**li jor vêlbaziye**
**wê ezê hertim dengê maf im**
**û dilekî dagirtî jiyan bim**

**tevlî kêrlêdanan**
**wekî xwe ezê berz bim**

# Çima

**Çima min ji te re digot**
**ji te hez dikim**
**û  hemî keser li dor me rawestiyan**
**û demsal bi dawî nebû**
**çima min ji te re digot  ji te hez dikim**
**û ez dizanim**
**ku gerdûn li ser kevîka  pîzotekî saxlem e**
**dixwaze ji ezmên re navekî din be**
**û rengekî din be**
**min dizanibû**
**ku dilê te bindest e**
**û mest dibe**
**bi evînê bi şiyarbûn ezê bimînim**
**dijwartir davekên dil dixwaze**
**bi awazêkê ku**
**li ber deriyê dilê te her sibehê dikute**
**belkî ew dîna hew bigrî**
**ta zêdetir ji te hez bike**

# Bêriyê dike

**Perdeya biskên xwe berdide**
**di her sibehê de**
**û jê re sirûda vegerê distire**
**ji dûr ve lê dinêre**
**paş pencereyên bendemanê**
**û di hembêza buharê de**
**dibîrtîne**
**şahiyê ligel eyazên wî**
**û evîna wî di dilê wê de her mezin dibe**
**dema ezman hêviya hevdîtinê dibarîne**
**ji eyaza giyanê maçek e nemir diniqişîne**
**li ser eniya bîrêkirinê**
**ew yarê heyî û nediyar e**
**tu ey perwer**
**ez bi te mezin dibim**
**wek zarokekî ji pêsîra dayikê xwe dimête**
**were ba min carek e din**
**ez ji berêvarê  hez nakim**
**paş volkanên dûrbûnê**
**ji te hez dikim**

# Perde distirin

**Min te baranekê binav kiribû**
**pencereya min şil dike**
**vê sibehê**
**û dema ez bi ken têm**
**ji sihwana dilekî hîn lêdide**
**min nas kiribû ku ew tawûsa bendewar**
**di wê şevê de**
**baskên xwe bi lavan fireh kiribû**
**ta ku riwê te bibîne**
**di çavên çemê**
**min  ji zû ve xwe li ber ezmên gerand**
**di wê şevê de**
**dema ew  perde  di kêlîkekê de lerizîn**
**û min nas kir ku tu tê yî**
**yarê min**

# Ne ewr

**Ne ewr**
**û ne zorî**
**û ne laveyên zordaran**
**serbilindî di me de dijî**
**û evîn jî**
**û li ser lêvên birînan**
**berken in**
**em rengê yê dixwazin**
**hez dikin**
**û welatekî xwe bilind dike**
**û giyanê şehîd**
**bi tilêliyan em erdê dikin şelt**
**û awaza evînê**
**di her cejinê de stran dikin**
**û zarokekî mîna bilbilekî şad distire**
**û keç ji nû ve xewinan dibînin**
**ne ceng me talan dike**
**û ne kole**
**û ne ji zordaran re**
**serdemek şehnaz heye**
**em şoreşek in**
**û şoreş welatek e**
**û welat evînek e**
**û tiştên ji bilî vê yekê**
**şîrov in**
**ji wî kesî re**
**li ser davekên evîna xwe awaz bi hêsinê dike stran**
**were em dîrokê xêz bikin**
**ezê pêşî navê te deynim**

**guh nede gurên birçî**
**û xemgîn nebe ji xemgîniya helbestê**
**were em ji welêt re bistirin**
**û ji evîn û dayika şehîd re  tevî êş û keseran**
**em ji nû ve**
**bên vejîndan**

# çirûşkekê di buhara evînê de

**Sibe wê rê xwar bibin**
**dar xwar dibin**
**reweştên şahiyê**
**laveyên buharê**
**av ji devê zarok**
**kenekî ji kevirê Sinînê**
**û deng beranberî êşê**
**xwar in**
**roniya êşan di giriyê helbestê de xwarin**
**tu xwarî**
**û dînbûn bi me di hemî aliyan de digere**
**ew jî xwar e**
**ew narvîna lanetbûyî**
**bihna te xwar e**
**xêza te ji peyvan xwar e**
**tîpa te xwar e**
**heta strana te yî ji kaniya bîrêkirinan**
**berve tîpên qubleyê xwar e**
**li cem nimêja perwînên li çûngê gulekê**
**ey elfebaya ya di ferhengên evînê**
**bicihbûye**
**hilma xwe ji mîkrobên min bibe**
**û bar bike**
**qurbanî di dola xweziyan de ketiye**
**û rohilatina hêviyan**
**ji çavên te ve qeyran e**
**dema zuhabûnê jî xwar e**
**wê tu di baxê nesrînî de rojekê bigerî**

**û ezê ji bilbilan re**
**stranên xwe yên xwar**
**bi bîrêkirina xwe yî xwar  de**
**li ser hesreta evîna te yê serdemî û rast de**
**yara min**
**bistirîm**

# Dirêj e ev şev

**Ev êvara dirêj e**
**ev êvar**
**cilê xwe bi riwê heyvê li min kiribû**
**û ev şeva kûr e bi şopên xwe**
**mîna meyek e kevinar**
**dikeve damarên min bi xweşî**
**tu ji xwîna min xwedayekî diafirîne**
**jiyan pêve rast dibe**
**bê ku pêwîstî bi pêxemberekî  pêncem hebe**
**were em di vê rojê de sema bikin**
**kefen ji nû ve şewitî**
**û em hînê li ser zikên êşên xwe de dileyzin**
**bi keser û mestbûn heta nîvroyê.**
**Ne nimêjekî di şêniyan de**
**henasan saxlem dike**
**û ne ez jî**
**li ser hêviyê**
**sirûdên demê di dema sozdayê dibîrtînim**
**de were em bisririn**
**hîn dem di destpêka xwe de ye**
**û gor hîn ava  nebûye..**

# Ew havîn bû

**Ew havîn bû**
**û ew rê bû**
**me dibe li cem payiza peyvan**
**ev mirin bi lez dihele**
**û ev bendeman jî**
**fedokî ye ew sêva gîhayî hêdîka**
**ew rê bi lez e û ew dem jî**
**ji te hez dikim hêdîka**
**û hêdîka li benda te dimînim**
**bejinên peyvan**
**bûn e xwelîreng**
**û dengê qurşînan jî**
**ez ji meznayî me**
**piştî min biryar da**
**ku ez zimanên derbasbûyan**
**li ser dîwarê narvînê de bigrim**
**hêdîka li ser xwîn û komkûjiyan dinivîsim**
**û ez bihna hemî derbasbûyan dikim**
**piştî her kêlîka bêbextiyê**
**kujer hêlabû**
**paş zindanên şilîbûyî**
**nêvê helbestê li vir e**
**û nîvê xwe yê din li ser baranê ye**
**hesret û lehiya cih  daleqandiye**
**ezê wê piştî pêl bi dawî bibe**
**û felek rast bibe**
**weşan bikim**

# Awaza dilsoziyê

**Ji destên min e belavbûyî ve**
**maç û ken û kenê xwe stand**
**rengê xwînê ji riwê xwe  ve**
**û bar kir**
**berî ramanbûnên rêyan**
**û ew berve ezê  tê**
**pala xwe li ser kevîkê dabû**
**çemek e ji stranên sar dabû**
**kenê wê dema ez distirînim**
**min diêşînê**
**ji taxê me dem hemî biribû**
**û hemî deng navên wê bûn**
**dema berêvarê**
**ne pêl dinivîsin ez kî me**
**û na ba dizanin derbas bibin**
**dinav  sirûdên narvînê**
**tenê ez yê min ji tehtên goran re**
**wateya dilsoziyê strand**

# Eynika çavan

**Di  çavên te de ez erdmîgarî û daristanan dibînim
û refên ji çivîkan
li ser derbasgehên temamnebûyî keser berdidim
pêlên firişteyan
laveyên ezmanî sirûd dikim
li ser sînga zaroktiyeke xewinyar û ji geliyên wê
ez romana evînê çêj dikim
di nav tiliyan de dema nîvroyê
mîna dînekî
li dor bîranînan
dizivîre
ritmên dildariyê dikim balgih
dema eyaza dûrketinê
ji riwê te ve tê
li ser axa giyanê
peyvên evîna me yê binaybûyî distirînim
bi efsanên li ser dara zeyzefûnekê
çengên min xapandibû
sirûşt wê berz kiribû
û buharek  e  din û awarte anî
wek wê nebû di derbasgehên dîrokê
li vir şev  ji nû ve bêdeng ma
guman neke ku ez dîn im
di bê de bê alê xeniqî me
tenê evîna me hate bîra min
û min laşên bîranînên xwe dabû hev
û sibe  neyt dikim ku bar bikim**

# Şêran ey rehjena min

**(ji wê û jê re ye evîn û bîrêkirina min e bê dawî ye)**

**Du kevok ji rehniyê**
**û bahilkêşanekê**
**li ser sînga yar de**
**tu…**

**te min ji baxê axê xwe mêjand**
**hezkirin û xewin…**

**perwîn û gulên ji buhara te**
**mijangên min bi defîneyan dadigrin**
**ji bilindî û şadî**

**roja rêya me  li cem te ye**
**dibe çira**
**dema rimên bîrêkirinê**
**li ser xirênên min de**
**di şevê de tên e xwarê**

**ji çavên te re ax libek kil e ji bilindiyên bîrêkirinan**
**ey kaniya a ku ji meqamên wê**
**bilbil  û reng kêf dikirin**
**şêran ey rehjen û ramûsan û xelkên min**
**bi te roj bi şadî şiyar dibin**
**û balkona evînê**
**li ser riwên te**
**resenî û spasdarî**
**ne mêranî di  te de sipî bû**
**û ne çavên mirovan razan**

# şadiya siberojê tu yî
# û maça bendemanê

# Destê min di destên te de

**Destê min di destên te de**
**û qumên bîrêkirinê**
**min kwaş dikin**
**berve milên te**
**berve welatekî ne diyar**
**henasên derbasbûyan qest dike**
**li cem texta xirênê**
**berve maçekê**
**li serdangeha gewher û murcanan**
**destê min di destên te de**
**û taca destana me gulî bû**
**li ser seriyên parastî de**
**ritmên yên geliyan ji hesretê xwe**
**dikin e sirûd**
**û dilê min tê xwarê**
**li ser pêlên û şewitî**
**hêsir û omîda xwe yê sipî**
**paş çirayên laveyan**
**ew reftarên yên pirsgirêka xwe**
**di navbera ez û ez winda kir**
**û te ey rebenê xwînçûyî**
**min di navbera şewat û şewatekê de**
**tên e kuştin**
**ma rêyek î ji derbasbûnê re berve welêt ve**
**diçe heye?**
**Pala xwe dabû li ser tîpek e ji navê te**
**ji te hez dikim.**

# Di nav tênosên min de

**Di nav tênosên min de**
**peyvên ji te re tenê ne**
**ji bilî te re naxwînim**
**ezê dema hevdîtina te**
**ji te re bixînim**

**ji kûrahiya van waran ve**
**xweziyên ev tîpan diteqin**
**û ew nalîn**
**hîn ê di nav çengan de**
**bedewtirîn sirûd distirînin**
**û ligel bîranînan ferhengekî ji hêviyê distirin**
**li ser destên narvînê**
**wisa biskên xewinê**
**û sîmfoniya roka çûyî paş rojbendên  bendemanê de şîn dibin.**
**Eger tu hatî li cem vê bayê**
**yê derbasî asoyê rojejê dibe**
**ezê li ser stranên  wê**
**awazan ji malzaroka evînê ve şêwe bikim**
**ew dîrok ti carî ne anîbû ziman**
**gotinên nêrgizê**
**ji maça te ya yekem e**
**min di gewherên gerdûna sermedî de xistin e**
**ez  û te**
**windabûnek î ne temambûyî ne**
**ez û tu wekî narvîna dîn in**

**em xişman di buxçeyên genimê de çedikin**
**bi rengê tarî de avis in**
**û hiek ji şekir e**
**ez û tu**
**zimanê me bi seyr bû**
**valabû ji dadgehê**
**yê firişt e rêsandibû**
**bi tiliyên roniya wê ya xwedayî ye**
**bi diyarbûna me ji buhiştin xweda û geşepêdanê wê ye**
**ez û tu helbesteke nivîsandî ye**
**li ser qeraxên dilan de**
**zimanê wê ji girnijîna davekekê te**
**û awaza wê jji buharek e dev bi ken e**
**dema me bi hevdû re dibîne**
**em bi bilbilan re sema dikin**
**ligel rokek e din**
**di her rojê de yara min**
**ji te hez dikim**

# Tu ne li vir î

**û dem bi me ve bi les derbas dibe**
**wek bayek î bi xwe re**
**çengê bêhêviyên me  dixirxirîn e**
**heta dawiyê**
**û bi me ve bi lez diçe**
**ji çîrokek î heta  yek e din ve**
**ji felekek e  bê peyv û helbest ve**
**ji hizrên me ve gerdena elfebayê**
**gerdena jiyanê direvîn e**
**li sînga kêliyê dikute**
**wek ewrekî êvarî**
**baskên sêdarên xewinên me kwaş  dike**
**berve kurtê ve**
**sibe xewinek e şikestî**
**û piştî siberojê**
**ez ne li vir im.**

# Evîn û şoreşekî

**Eger rê li cem perestgehan be**
**wê min negihîne çavên te**
**ez wê narvînê naxwazim**
**ku sirûdan li ser gora min e belavbûyî de vir û li wir**
**li darbixîne**
**ew vedengên hatî**
**ji kûrahiya bêhêviyê**
**dibe ku moralê min wekî davekekê serjê bike**
**ev şev nimêjên xwe temam nake**
**ji bilî dema me a xweinên xwe**
**di warên çavên te yên xweşik de**
**lê yara min birjîne**
**li benda min bimîne**
**di dîtinek e nû**
**ezê ji şehîd re**
**navnîşanek e nû binivîsim**
**ta ku di nav  hevokên duriwan de winda nebe**
**berî ku di elfebayên nepenî**
**û  zeferanan de bikeve**
**de were em di rêyek e din ji perestgehek e din de biçin**
**dûrî stran û nalînan**
**dibe ku em cihek î ji nimêjê re**
**ji bo xwedayekî me bi dilovaniya xwe şad bike bibînin**
**piştî her evînekê**
**û piştî her şoreşekê**
**de were ey bilind çavê**
**hin hêvî heye**
**ji te hez dikim**

# Germahî di çavan de

**Germbûna hêrsdar ji çavên te ve**
**nameyan rêdikin**
**û bîrêkirina sor mîna volkanekî ye**

**eyaza evîna te tê min**
**wek baxê xewin û lehî ye**

**ji  çavên te niviştên hêrs  e**
**kesera min bi heyecanê dikuje**

**ey jinek e ku awaza xweziya min dihelîne**
**bi azariya temena tarî**
**û bi derewan.**

**Genim qirikan badidin**
**li ber kanîka evîna te**
**û  peravan**

**êdî dem hat**
**ku şehnaziya  te min bibe**
**berve buhareke kesk û avaker ve**

**berve deştan**
**berve  mêrg û geliyan**

**ey jina a ku di temenê te**
**mîna liban**
**rêwî dibe**

**mîna leylana birîndar û bi ahîn**

**de di cîgeha evînê de bike awaz**
**bê aramî**
**ev evîna me ye**
**û ev dînbûn e**

**û ev şeva**
**min ji te re wek dînekî diraje**
**ji bo nivişta evîna te**
**nimêj  û aramî**
**ji te hez dikim bêhtirî çirûsîna çavan**

# Baran min  dibe

**Carne baran min dibe**
**li cem wan rêyên kujer**

**li cem dînbûna êşa hemdemî**
**paş nîşanên bîrêkirinê**

**dema her tişt diqede**
**dema her tişt xwe bi dawî kir**

**carne min bi ahînan şil dikir**
**û carne bi kevirên êşên sêwiyan wer dikir**
**di qurbaniyên biyanî û dûrketinê**

**çi ewr bû ewê min seyr kir**
**piştre di bîra êşên binaxbûyî de ketibû**

**ne mirin mezin dibe û ne  ez..**
**tenê ez li benda tiştekî ji narvîna xwe me**
**paş daristanek e dişewite..**

# Mirinên du qubleyan

**malik di  çavên wê de namirin**
**û ne elfeba jî hebûnê dugrînin**

**nîva wê ji demê ye mîna gerestêrkekê ronî da**
**û nîva wê li ser xwelîdanka bîrêkirinê de heyî ye**

**ji   hinarikên wê de ewlehî û hebûn dadiket**
**û maç ji rûçikên wê ve bêdeng ma**
**pêşengtiya gerdûnê wek heyînekê dike**

**du kevok di destpêka buharê de bi mestbûn dikin qebqeb**
**di asoya xweziyên  nasbûyî de**

**herdû  sipî ne mîna gerestêrkekê di ezmana dil de bi xurtî**
**tên e xwarê stran û bîrêkirin**

**ji du maçan ve  mirin tên**
**bi evînê bûn stûxwarî û  noqbûn**

**ji me re ew êş sond bûn**
**bi sînoran ve teng bûn**
**lê dilberê hêdîke**
**eger felek giran kir li ser dilekî tûj de**
**ev mestbûna evînê ye**
**bi leşgeran naye tirsîn**
**me çand û nivîsan  ew bergirî**
**mîna havînek**
**germahiya wê pîzot bû**
**çendîn hebûnek ê wêran kiribû**

# Rêwî

**Rêwî me**
**di nav baxê henaseberdana te de**
**berve baxê jiyanê**

**tu bi tenê**
**hêviyê çêdikî**
**derveyî ew birînên yên di kurahiya welêt de**
**xwar bûn e**
**rê berve riwê te**
**encaman derbas dikirin**
**û şekirê ramûsanê**
**û vedenga xweziyan**
**di dengê kew de**
**were em bi dar re sema bigerînin**
**û stranan bûkînan bikin**
**were em li deriyê**
**rêyên lêbidin**
**û dîwarê nalînê bi davekê hilweşînin**
**were em li ser bê**
**xweziyên gul binivîsin**
**ji te re êmega dûrketî di vedenga narvînê**
**tu hîn dûr û rizgarkirî yî**
**li ser vîna awaz û dîmenan**

**were em dîrokê bidizin**
**û awazênn felekê birêkûpêk bikin**
**were em ji nû ve ji şevê bidizin**
**li vir findên bîrêkirinê**
**tenahiyê disojîne**

**ji min re û ji te re**
**hezar nimêj li ser xewina rêwîbûnê**
**ji bo te tenê**
**raziqî kevir paçe dike**

# Barkirin û tabloyekê

**Ezê te mîna deziyekî nerm te nîgar bikim**
**tu mîna zarokiya min î**
**di nav êş û hêviyê de**
**di nav buxçeyên şîn û mêrgan**

**ezê fîstanekî  qedîfe birêsînim**
**ji  guhmasiyên bîrêkirin û heyvê**
**û şev dema bêriya min dike**

**ez te navnîşanekî ji  dilxweşî û stêrkan ve**
**nîgar bikim**
**ezê bi gulên henarê ve bang bidim**
**dema bîrêkirin min reşkuj dike**
**li cem riwên te yên binefşî**

**ezê te sêvekê li ser maça êşê de nîgar dikim**
**windaye di nav hilma evînê**
**û kavila tenahiyê**

**wê tu min bînî bîra xwe wê demê**
**dema ew deziya neqşkirî**
**ji te dûrbikeve**
**di nav nalîn û nalînekê**

**di wê çaxê de ezê wê gavê qur bikim**
**wêranbûyî ye di nav şev û rojê de**
**di nav hêvî û êşê**

**û ji kurahiya tagirtinê û volkanê**

**ezê bar û hezkirinê xwe rakim**
**û bar bikim**

# Kefen wê bistire

**ji her rehniyê ve**
**çîroka welatekî  gunehên xwe veşartibû**
**di  kadiza xweinekê de**
**pala xwe rojekê dabû**
**li ser dîwarê tîpekê**
**rojekê  navê te dikir sirûd**
**xwe rast bike**
**li cem vê rehniyê ve**
**dibe ku ew kefen bistire**

# Ferînaz Xisrewî

**Laşekî di valahiya damaran de**
**aramiyê ji rihên bêdengiyê ve dimije**
**û bi  salên dirêj**
**ji şewatgehê xwînê re  bahozê red dike**
**ji axa xewinyaran ve.**
**Ey şehîda nermîn**
**tu ji giyanên hezar firiştê ve derketî**
**dema tu hatî xwarê**
**bi ser xewinên windayan  ve**
**ta ku tu finedekê**
**û hêsirekê vedî**
**û gelek ji xwezî û bangewaziyan**
**li welatekî li bendê dimîne**
**kî wê bistre li ser viyana xwe**
**Qazî Mihemed di gora xwe de**
**Ferînaz**
**ey şînê di perdeyên kabeyê**
**bi te bedewtirîn al tê**
**kurdistan  buhişta te ya nemir e**

# Alanê Kurdî

**Bi çûkê min netirse**
**negrî**
**nemire li ser balgiha mirovahiyê**
**ewan yên di kûrahiya xapandin û şikestinê de  fetisî ne**
**pêl û stêrk**
**henaseberdanên xewina te berçav dikirin**
**ta ku tu berken bibî**
**te di di cinavê xwedê de xistin**
**ta ku dîmena te bibe**
**lekeyek şermîn li ser riwê mirovahiyê**
**ey   paktir ji hemî hêsiran**
**di razana te  li ser aliyên bêhêviyê**
**te hemî dîmenên cîhanê kurtas kiribû**
**cîhan şilîbûyî û kovanbûyî**
**ezê ji bo te bi hêsir bim**
**heta ku ez sax im..**

# Ew  kefen bû

**Ew kefen bû**
**û dengekî bû**
**dema firişte  ji kujtina wî qêriyan**

**ew girî bû**
**bi reng û nalînên bi êş**
**di gorên bêbextiyê de xeniqî bû**
**di  azana nivîştê**

**ew zarokek bû**
**ferehê peyvan**
**ronîbûya pistepistan**
**bi rehnî ye**
**kêfa rokê ji tewandinê re ji bo wî tê**
**bi çar aliyên bê qubleyê**

**ew ez bûm**
**ewê mirî tam di gîhaya deryayê**
**bi hêrs û bi êş**

**ew bû û ez rojekê nebûn**
**piştî ew dilê binaxbûyî**

# Rehniya kesk

**Li ser şanoya bîranînan**
**ji te re dinivîsim**
**helbestekê ji şînbûna çavan**
**û ropelekî ji rehniyê**
**jêre zaroktiy xwe bi ronî dikim**
**û bîrêkirina min**
**û demên çîrokan li ser dara rojan**
**were em  bi xewinan re bi çil zimanî sema bigerînin**
**û yên din ji kefenan re bihêlin**
**hizrê me  yê nemir çira dike**
**were berve roniya kesk**
**di nav lêv û  herdû  dilan**
**û temenekî din ji bîranînê**
**ta ku em rojekê demborîna xwe bi bîr bînin**
**Kobanî bi tenê**
**hêjayî te ye şitlekê kêlek wê**
**ey bedewtirîn helbestekê**
**ku min hezar carî xwendiye**
**ji te hez dikim**

# Ey biyanî

**Ey biyanî**
**serê wê di kulika davekê ye**
**di çavên te de rojek e**
**ji bo dûrketinê ji welêt digrî**
**ji bo dûrketinê ji hezkiriyan digrî**
**di felek e lahotî de**
**feleka dînbûn û nedînbûnê**
**di çavên te de ala zaroktiya min e**
**bi hêlanên lawaz re diaxive**
**têde lehiyek e hêrsdar e**
**berve cîgehên hêviyê**
**berve buharê çavên wê**
**û gotargotina miriyan**
**di sirûdên stranekê**
**ey biyaniya dîn**
**ji te hez nakim**
**li wir paş mija zivistana te**
**welatê min e**
**berkenê bi sir dilê evîndarekî ye**
**di hezar sal ji bîrêkirinê**
**û hezar helbestek e bi awaz**

# Bi te dikeve

**Bi te dikeve**
**hemî bajarên germ**
**yara min**
**û tu li ser kenarên wî dimeşî**
**mîna periyek e evîndar**
**xwe bi ava çavê min dişo**
**di şevbûhêrkên  şeva narvînê**
**ji te hez dikim ..**

# Çiraya şevê

**li ser çiraya şevê de dawîpeyvê min binivîse**
**ey giroverê mîna  sewika rojê**
**min di elfebayên hebûna xwe wîne bîr**
**tîrek î ji dilopa bendemanê  ji derve maye**
**ey meyzekerê di xweziyan de**
**berve buxçe û beybûnan ve ez dinêrim**
**mîna deştekê li jor newala buxçeyan**
**ji te re dinivîsim**
**hezar neme di pîzotgeha nalînê**
**û ji te re ji bîrêkirina xwe**
**nîşanan ji nimêjên te re dibêjim**
**de berkenekê xelatî min bike**
**piştî hemî ev narvînê**
**ji bo bibim şehîdekê**
**yara min**

# Ji te hez dikim

**Ez di çavên te de bi cih dibim**
**di kêliyên đînbûna min de**
**gupekê ji meya peyalan ve di riwên te**
**min dixe buhiştê**
**dema ez dimînim di  jiyanê de**
**ma ji bilî çavên te ez dijîm?**
**Kanî gul?**
**Ku  perwînan ji  dilên min negirtin**
**ti hilm nîne eger eyaz  jê wernegre**
**û ji lêva gulek e di min de**
**ez ji te re hezar helbestek e evînî xêz dikim**
**di pirtûkek e pîroz de kom dikim**
**li derê aramiya te de dihêlim**
**ta ku tu bi min dilovan bî**
**ji dojeha tenahiyê**
**roja dawiyê**
**ji te hez dikim.**

# Paş rokê

**Berve paş rokê
û ev maçê sereftî
ji min re nanekî bê dawî çêdike
ev darbest a min e
û van têlan jî
ey evîndar mîna darekê
digrî dema şikestina min dibîne
narvîn tu ye
û hemî van çirayan
rehnî nizm
ji bilî dengê te
ruknên dilê min şîn dike
her şevê li berbangê
tu yara min î
bi hemî hêza xwedayî
ji siberojê ve baştirîn nimêj werdigrim
helbestê nenivîse
sibe ezê ji te re nîşanan
ji her çar pirtûkên ezmanî bixwînim
ji her nîşanekê maçekê
û paş her nalînê çîrokek azariye
ma ji hezar hêsir û şikestin
ey xendiqiyê di deryaya mezinayî yê
ez hînê ji te hez dikim**

# Pistepistekê û ewrekê

**Şeva te şayik e**
**û berban li benda diyarbûna dawîpeya min e**
**yê girover berve jorê**
**û tu dinivîsî**
**ji xewinekê hate min ji salan**
**hîn heyvek heye**
**dînbûna dawîpeyvan hizr dike**
**ma xewinek heye**
**kesera penaberiyan sirûd dike**
**an pirtûkekî gotarên koleyan**
**di şevên bêhiş de ezber dike**
**xanima min**
**tu dînbûna min î**
**û kena serdemî**
**husteyekî berve kefenê xwe bi cih kiriye**
**de li ser rêya gavê min de rûne**
**tu hîn   kurtana kevok dirêsînî**
**ta ku ez ji  tenahiya xwe ya siryalî dûrnekevim**
**û ez hew xwe datînim**
**li ser hevokê evîniyê**
**yên berve pakiya min**
**xwe vekişandine**
**bi xweziyan pêşeng e**
**de bi rêkeve**
**ewrên tarî li bendê yên sipî namînin.**

# Elfebayek e  bala

**Çi tîp tu fêrî bûyî**
**dema min zimanekî dabû te**
**ji bo tu jiyanê bijî**
**bi  elfebaya wê ya bala**

**ma min nepeniyê  ji zû ve dabû te?**
**An  min navnîşanan revand**
**ji sîngê çîrokan ve**
**bi lezbûna birûskekê**

**ma min soza çênebûyînê ne dabû te**
**ma min sosin ji bo te ne weşandibû**
**li ser sînga xêzan**
**û bihna peyv û poxîran**

**çawa tu hîn fêrî ku jiyan gemiyek e nebûyî**
**berve ewlehiyê diçe**
**û berve xeniqandinê**

**tu dizanî li ser heyecana deryayê**
**dema tu di nîvî de bimînî**
**an  di hêrsa ezman û dilan de**
**dema tu bi tenê dimînî**
**li ser erdê**

**ne evînek çûye**
**ne hovîtî**

**an dînbûn**
**em hemî berve gorê ve diçin**
**sînga kevokê şînî nagre**
**de hemî efanan binivîse**
**ku te xwest wê tu bixwînî rojekê**
**û bîne bîra xwe ku helbesta min**
**hîn di destpêka xwe de ye**
**ji te hez dikim..**

# Dilopek av

**Dikopek av**
**li ser riwê stêrkek e sipî**
**min dibe berve hilma wê**
**mîna gula binefşê**
**nalîn bi min xweş hat**
**di nermiya rehnî û hêviyê**
**bîrêkirin di warên nimêjê xwe bi cih  kiribû**
**bi tenikbûna peyvan**
**berve rêyan**
**û sihên aramiyê bi dawî kiribûn**
**di kûrahiya bendemanê**
**wek xunavê dilop dabû**
**li ser ewra xewinê**
**û di buharê de dijîm**
**mîna demsalên bîrêkirinê**
**ji nû ve**
**û nalîn wek xewina welêt**
**mezin dibû**

# Şev û fêrbûn

**Şev rengê xwe pîroz dike**
**li ser  peyala têlê**
**û giyan xewina wê asteng dike**
**û baran  dildarê wê  dibe**
**ne dost dibe hogirê evîna wî**
**û ne kesê perwer heye**
**kî  haj aramiya tagirtinê dibe**
**ewê kevin bi rengê gulê**
**evîna wê evîna me ye**
**û rastiya xwezî belav bû**
**de ji bilindiya xwe ye sipî ve derkeve**
**mîna ahengekê**
**û min bibe bi zanista nepenî û fêrbûnan**
**bi xapandinên felekê eger derketin**
**buhara temen narvîn rêve dibir**
**tu ne ewê ku zengilên karwanan dikute**
**şev  rengê xwe li xwe dike**
**û xewin ji  bo pesindayîna giyan teqiya**
**de şev û çîrokên wê nekuje**
**maça jiyanê heyvê diçîne**
**te vegere li ser hişê xwe**
**ey ronîbûyê mîna armancê**
**ji awazên nimêjê re tu bihane nîn in**
**ji hemî şevan re navnîşanên xwe  ne**
**û ji şeva min re**
**bîranînek**
**ezman**
**û   hilmekê**

# Bê evîn jiyan nabe

**Evîn  dibarîne bi şerpînî li ser min**
**û min di rêya rast  de dibe bi maçekê**

**ji min re hezar helbestî di yek rojê de**
**dinivîse**

**û li ser qeraxên bîrêkirinê**
**min bi agirê evîna xwe disojînê**
**bê hampa**

**Ey roka  diyar di kûrahiya gerdûnê**
**dilovanî û hêviyê bidiyê**
**ez kêlek van  bîçiman im**
**ewrê tev didim**
**ji stêrkên rijî**
**û meydanê**

**sirûd awazên xwe bi êş in**
**û sorê lêvan**
**mîna meya zordaran**
**li ser maseyê kesên yên nû şehîdbûn e**
**birî dibe**
**ji bo li ser xewina kalan de çûnser bibe**

**ji te hez dikim li ser kenarên helbesta nemir**
**hêdî be ez te di nav keziyên peyvan de belav bikim**

**di her berbangê de**
**li te vedigerim yara min**
**ta ku ez di valahiyên bendemana te de xwe bişom**
**berî ku ez di dojeha dûrketina te de  bimrim**
**ji te hez dikim**

# Maç û bendemanê

**Ezê wê tînim bîra xwe**
**dema maç ji riwî wî koç dike**
**û xwe li ser pencereya bendemanê de sist dike**

**stranên wê di rukna rêyan de distirin**

**ji min re dibêje:**
**were ey windayiyo mîna tekera felekê**
**ji vir ji kaniya xwina xwe dagre**
**peyala hevdîtinê vexwe**
**û biçe li ku dixwazî**
**dem hêrsa bazdayiyan dikuje**
**û tu**
**ji evîniyê peyala jiyanê werdigrî**
**bajarekî tîbûyî av didî**
**li ser kevîka welatekî birîndar**

# Serê xwe rake

**Serê xwe rake yara min**
**dema hezar firişte dimînin**
**li dor te ve xwe ditewînin**
**bi bêdengiyek e kûr**
**ji hizrê karwanan ve  tê**
**stuxwar ji pakiya te**
**dema tu dibe evîndar**

# Şev

**Şev min dibe berve çiraya rêyan**

**dirêje ew refê ji ewrê**
**hemî xweziyên min li ser domahîkê de vedimrîne**

**di elendê de bi te  paşîvê dixum**
**li ser dengên stranan**

**hemî memik  berken dibin**
**ji bilî ew çemê ku ji dûr ve diherike**
**paş çavên te yên matmayî**
**bi laveyên evîn û dînbûnê**

**di rêyên dirêj de**
**li ser kevîkên  bêhêviyan de dimeşim**
**pişt re  di qurzîkekê ez rûdinim**
**ji bo şevbuhêrkên evîna germ**
**li ser sînorên bendemanê de**
**ji te hez dikim**
**eger çiqas dirêj be**
**û çiqas laveyên gularezê ne diyar bûn**
**li ser laşên xweziyên me**
**wê tu wek e xwe bimînî**
**ji te hez dikim.**

# Çavên min

**Di bêdengiya te de ez dînbûna xwe dixwînim**
**û bi kilê çavên xwe ez henasên te dinivîsim**
**bêje kî bi yekbarî ji te hez kir?**
**Bêhtir ji zelaliya bijangên min**
**ewê yê te di asoyê de wateyên evînê xêz kiribû**
**û ji gul re hilma henaseberdana te**
**çi kesê ku li bilindiyê de rêwî çû**
**ji xewin û balinde û çivîk**

# Şoreşa xwe lidarxistibû

**Li ser riba wê ya xala**
**û ji dilopek e xwîn**
**di gewdeya min de**
**şoreşa xwe lidaristibû**
**hember dawîpeyv û tîpan**
**yên ji êşên şevê**
**û çûkên wê yên koçber bişkîvîbûn**

**ta ku ji dilê min ve şewatekî bikşîne**
**bi hezar maç**
**û rehjenek bîrêkirin**

**û ji nermiya sloganên wê yên pîroz ve**
**ez mana xwe ji  evîna wê  re dihêlim**
**ji hezar salên bê**
**wisa ez fêr kiribûm çawa ez azad bimînim**

# Kobanî

**Kobanî**
**di nav pexember û pêxemberekî**
**hezarên pêxember tîne**

**kobanî**
**rehniya xwe daye li ser tîpên xwedê**

**kobanî**
**xêzek e ji dîrokê**
**bi dilsoziyê xwe nû dike**

**kobanî**
**noqa cîhanê**
**keçkaniya xwe winda dike**
**bin çirûsîna kêfa te**

**kobanî**
**tîrêjek e di sîngê evîndarek î dîn**

**kobanî**
**efsanek e ji çîrokên nemiran di malzaroka felekê**

**kobanî**
**keça rojê**
**keça dilsoziyê**

**ma ez dikarim ji hilma zendên te**

**bihna  fedîbûn û mezinahiyê bikşînim?**
**Tu dikarî ji buhara xwe re temenek e din binivîsî**
**ji bo navên te yên zêrîn**
**tîp in ji dilê min**
**û ji giyanê min tînî**
**xewin di her kêliyê**

**kobanî yara min**
**bimîn e baş..**

# Kurdistan cîgeha lehengan

**Bi xwîn û agir**
**û dengê maf û xêrxwazan**
**alên û nîşanên me bilind dibe**
**bi xwîn em rê rast dikin**
**di awazên xwezî**
**di narvînê**
**vedenga maf berz dibe**
**û li ser qunaxan de balatir dibe**
**ev roja me ye**
**kurdistan evîna biçûk û mezinan av dide**
**di lutkeyên çiyan**
**çavên ku cih û bilindbûnê çavdêr dike**
**kanî Şêx seîd û Qazî û Barzanî**
**Leyla Qasim û Doxan**
**xweşî ne di rûniştgehên dîrokê**
**û ev serdem wêranker û avaker e**
**gula Nîsanê bipejirîne**
**hilmên şehîdên kobanî**
**çavên wan bi evîna welêt dagirtîne**
**û riwên wan kurdistanê qest dike**

# Sirûdekî wekî  êşa min

**Li vir  sirûdekî mîna  êşa min e**
**mîna serê peyalê**

**mîna volkanê**
**mîna zaroktiya min e   ketî**
**di hevokên bîrêkirinê**

**xweziyên fedok**
**li ser  qoçanê salan**
**hogir, kezî û find**
**di çavên rojan de..**

**dema li wir helbestek e windayî**
**di navbera elden û  bêzarbûnê**
**di navbera xewin û narvînê**
**di navbera aramiya şeva**
**ku xwe bi nalîn û bêhêviyan ve nixûmandî**

**li vir û wir**
**paydariyek e   devên birçiyan pele kiribû**
**derbasbûn, û sihên balindeyan**
**bênîşekî dereceman top  kom dike**
**ji taybetmendiya xwatirxwestinê**

**kavil in li ser lêva birînê**

**zamrûtan gul didan**
**dema merasîmên giriya dirêj  temam bûn**
**li vir goristana saxleman e di malên welêt**
**ew buza zordar zor li min kiribû ku ez bi talî bimînim**
**paş seyrana bendemanê**

**ji min re çirûsîna hebûna xewindar diyar dibû**
**di nav kef û xweşiyê**
**min vedengên bêbextiyê ji nû ve celewkiribû**
**û min li ser mirina dînekî re  nivîsandibû**
**sond xwaribû ku bi min re be rojekê**
**berve xwatirxwestinê**

**min şîreta xwe  ji şanişîna deryayan re**
**nivîsand**
**ji ber ku çete her hevdîtinê berî  fetisînê**
**dorpêç dikin**

# Dema berêvar hat

**Destên min qest kiribûn**
**di lepê min de çiqlek û zeviyek e**
**û  bênderek e ji xweziyan**
**bin rokê de mîna zêr şewqdan**

**bi amadebûna xwe mezinahî**
**çax û bengê min**
**û xêzên sor di qeraxa nalînê de qest kiribû**
**min berî nimêja sêwiyan maç kiribû**
**di riwê sibehê**
**û mîna keliyê barkiribû**
**min di giyanê wê**
**hembêzkirina me ya herdemî qest kiribû**
**paş zimanekî**
**em herdû bê hişmend têdighênê**
**ji ber ramanbûn di gavê şîrevekirinê de**
**taybetmendiyek e xwedayî ye**
**me herdû bi xwe re hiştibû**
**berî çaxa hevdîtinê**
**di lehiyek e ji evîn û helbestan**

**û wisa**
**hembêzkirin û stran bû**
**li ser dengê bîrêkirin û awazan**

**ey dînê di warê helbesta min e asê de**
**ez hîn  ji te hez dikim**

# Hevdîtinekê di hembêza rokê

**Dema  zendên te bi lez ji min dûr dikevin**
**ez di lepên xwe  de nimêja ramûsanê**
**kumkum dikim**
**û li ser lêvan ziman in , penage û qerenfîl in**
**bi ser ve kovanê xwe û sêdarên zelaliyê dibim**
**û vehesînê li ser bîranîna yar**
**bi destmêj û ahîn û rêya rast**
**li ser gupên xweziyan**
**ji min hilma xwatirxwestinê bipejirîn e**
**ji sîngekî ku  li ser awazên wî**
**berbenda stranan zuha bûn**
**û li ser roznamya xwe deyne**
**felekek e ji awazan**
**ez hînê di siberoja te de awazek im**
**hîn kes bi serve ne biriye**
**û hîn bilûr dilerize**
**di nav destê evîndarekî wekî  te**
**de were ligel bê hinekî vehese**
**dibe rojek hebe**
**hîn roj têde nehatibe hilat**
**û dibe ku li ser kevîka narvînê de li benda me be**
**were cem rojê xweşewîstê min**
**ez hînê ji te hez dikim..**

# Xewin distire

**Perwîn li ser laşên gulan de bi kurtasî reqisî**
**xwestibû ku rengên xwe**
**buharek e  bê nûkirin**

**ji mirinê re cejinekî ye**
**mîna ku ji cejinê re nimêjekî ye**
**û dema ku gor  avbazgehekî  be ji hêsirên perweran re**
**ne perwîn ji ketina xwe dinale**
**û ne ez li ser bajarê xwe ji nû ve digrîm**
**ref bi tifingan hatin e girtin**
**û ezê koçbûyî li ser cadeyên bêhêviyan**
**ezê xwe bi xewina vegerê bixemilînim**
**dema ku narvînekî reşbîn nebe**
**û xalek sifr bê dawî nebe**
**Kobanî**
**bi tenê wê bê dîmen bimîne**
**ji bo wê kernevala Dunkîşotî**
**ê bi bê ye dibeze**
**li cem stranekê wê li dawiyê de pêşkêş bibe**
**çîroka evînekê**
**di navbera mirin û mirinekê**

# Şev û şînên xwe

**Li ser lêva wê ya bi ken**
**meya bîrêkirina min dihele**
**û kevok ji sîngê wê ve ref pey ref difirin**
**paş çirûsîna rehniyê**
**di serdangeha bîranînên me de**
**lave bi hemî rengan ve derbas dibin**
**mestbûn şîn û erxewanî**
**rê di navbera nalîn û nalînekê**
**dilzarî nîne ji vê rokê re**
**di buxçika evîna me ya hemdemî de**
**û ketinek nîne ji dara tû re**
**dema ji bê re nepeniyên me ezber dike**
**felekek e nû**
**narvînek e nû**
**rojek e nû**
**bi hêşînbûna ezmanekê û pîrozbûna evîna me ya şeytanî**
**ez û tu**
**li kêlek xwedê**
**emê biaxivin…**

# Ey Şevo

**Min bi wê nalenalê**
**di vê şevê de mest bike**
**bi van keziyên jibîrbûyî li ser rêyan**

**min  li ser lepê xwe yê dirêjkirî ji bo şeqamê rake**
**ez bi dînbûna hilma te windayî me**
**xeniqî me bi  heyvê**

**min xewinekê li ser têlên zaroktiyê nîgar bike**
**bas kê perwînan xelatî min bike**

**eger te xwest**
**min mîna libên birincê  bi ser peyvan ve belav bike**
**an min wekî helbestek e pexşanî**
**bi hemî zimanan ezber bike**

**ezê te ji  mêwa nalînê av bidim**
**dema henar li ser dara helbestê de gulgulî dibin**
**û pirtûka ezmanî nameyên xwe dighînin kûrahiyê**

**ey şev**
**dema welat ji hembêza buharê re vedigere**
**û zivistana te ji  kajê bardike**
**dema em awazên nû bi rastî   dijenînin**
**ligel fîxanên bilbilan di bajarê min de**
**û  raziqiya şamî vedibin**
**wê çaxê tenê**
**ezê bi dînîtî ji te hez bikim..**

# Ew herî baştir e

**Ewê baştir e eger tu bi destên xwe min nekujî**
**destên te yên ji  her awazê ve hatin e birrîn**
**û pişt re kulên min nîgar dikin**
**bangên min**
**demên nimêja min**
**li ser têlekê ji bîranînan**
**û  li ser nivînê**
**li ser memikê digrî**
**di her bêhêviyê de**

**eger te çinî kir venegere**
**û te şikênand venegere**
**û te dizî**
**û tu  girî**
**venegere**

**welatê min ne tu ye**
**piştî niha ez te ji nû ve rehet nakim**

**min di te de hemî rojbendan ji xwe berdan**

# Ey kevinarê

**Ey kevinarê**
**di nîvê talîzokan de**

**li benda min bimîne**
**navbera xêzekê**

**ey bazdayê**
**ji giraniya xewinek e winda**

**demê bide min**
**dengekî ji hêrsê**
**bi çîrokên kûr ve ketî bûye**
**lê sînga berfa germ**

**li min di dilê ezmên de bigere**
**di jena destana min e nemir de**
**ew hînê amade ye di asoyê de**

**nasnameya min**
**navê min**
**û kefena gengazan**
**ji darên hêviyê çêkirî ne**
**ne windabûn paş volkanê ye**
**û ne tu berbenda gengaziyê yî**

**ji bîcada helbestê ve bîrêkirina min bibe**
**û ji pêsîra gengaziya min ve navnîşana kenê xwe ya ne diyar**

**ez ketim hembêza buxçeya te**
**û zeviyên geşiyê ji gupê te**

**min laş ji giyanê xwe bi maçan belav kir**
**de xwe çeke di riwê peyalan de**
**ji gerestêrkan re du tewandin nimêj bikin**

**ji dînan re ne welat û ne cihê razanê heye**
**ne tax nûçeyên evîndaran bûkînan dikin**
**û ne zarokekî pey bê diçe**
**û tu çîroka min e bi êşî**
**heta hetayê…**

# Û bû ku

**Û bi ku**
**min li ser welatekî giriyam**
**li ser biyaniyê giriyam**
**û dûrketinê**
**û şewat û evînekê**
**lê belê**
**ez tu carî ne ji binkeftiyan bûm**
**ji bilî pêş çavên te**
**yên  şewqdabûn mîna hevrîşmek e hindî**
**bi heft rengên wê**
**xweşewîsta min…**

# Sazjeniyekê li ser mijangên çavên te

**Stran di buhara çavên te de**
**vê sibehê**
**û eyasên tenik**
**asoya dûr derbas dikin**
**nalînê dikin xunav**
**di neqşeya dilekî eware**
**ey  şînê mîna rokê**
**hemî çem germ in**
**dema rokê derbas dikin**
**gotarên xwatirxwestinê**
**hemî çem xwar in**
**berve rehniya çavên te ve**
**di sibehên rengîn de**
**bi keskesorê…**
**ey qereçiyê bi rengê jiyanê**
**de were em buhiştên ezmanan vekin**
**bi kenên xwe yên har**
**were em dilên ewaran lêdin**
**ta ku li welatên xwe bigerin**
**di dilên evîndaran de windayî maye**
**were em di roniyê de bijîm**
**ji bo ku em bi astên xewinên xwe re bala bibin**
**bi çêja reyhanê  werivî ye**
**were li vir**
**zaroktiya me pêş bê ye**
**li ser awazên bîrêkirinê**
**yara min..**

# Kêlî

**Xweşiya kêliyê**
**di nav  guhmasiyên bîranînê**
**û morîka lêketinan min bijare dike**
**di nav ziqaqên nalînê ez  digerim**
**mîna  yê bi  girê bendemanê ketî**
**li ser dîwarên rizî de dixwînim**
**peyvên ku bi lez hatibûn e danîn**
**bi xwatirê te**
**ji dilekî re paş maçek e netemam bûyî re**

# Şev parçe bû

**Û şev**
**bi çar aliyên xwe ve parçe bû**
**gulên sor bê têl**
**mîna xêzan li ser wan dîwarên bi xwelî**
**ji roniya çavên te ve**
**dîmenên welatekî**
**li benda mizgîniya barkirinê ye**
**wergirt.**
**Ta li di nav hezkiriyan de raze**
**dema vedeng di goran de diqedin**
**û şev parçe bû**
**di dawiya gerdûnê de**
**û destpêka hevdîtina  bayên me**
**ez û tu ..**
**li ser sînga kevokek e xalîkî .**
**Ez digrîm**
**û di kûrahiya min de destanek  evîn e**
**ligel bayê destpêkê de jidayik bû**
**dema dîwar kê berve hêrsê biçiya**
**û ji bêdengiya gulek e xemgîn**
**min şewqa evîna te biribû**
**cem   comek e dîn mîna te..**

# Di min de wek evînekê dijî

**Hîn di min de dijî**
**û hîn di wê de dijîm**

**neqşeya rehniyê bi pêl dibe**
**di nav destên wê de bi dilopan**
**li ser rêyên êşê**

**bi kenên xwe yên suryalî ve**
**min dibe dawiyên dînbûnê**

**dema ti erdnîgarî xweziyên min ranakin**
**û ne ez jî dikarim bi têlekê sazjeniyê bikim**

**hîn di min de dijî**
**payîzek  bîbelanekên êşên me bi fetisandin dadigre**
**û hînê**
**ez li ser rêya nebûyî li bendê dimînim**

# Yara min û hevdîtinê

**Yara min…**
**riwê sibehê dişo**
**bi kenê xwe**
**û gelek dikene dema rohilatê**
**silav û hezkirinê pêşkêşî min dike**
**û ji min re navnîşanên nû ji hevdîtinê re dinivîse**
**û di her hevdîtinê de**
**min di bejinê xwe de dixîne**
**li ser awazên têlê**
**ez rebena wê  me**
**û jê re hezarên peyvan datînim**
**ta  ku li ser dawîpeyva xemgîniyan biserkeve**
**di  serdavên bendemanê de**
**û ji bo ku ji min bêhtir hez bike…**

# Xewin û evînekê

**Kaniya xewina te ya sorgulî  bêhemdî**
**min reşkuj kiribû**
**di nav rawestgehekê ji bendemanê**
**çav li min gerandibû**
**bîrêkirinek  min bi xweşî û tevlîkirin**
**ez dîtibûm**
**wek şîreta sulafê ji peyalê re**
**wisa li kêlek genimekê de şîn bû**
**bi hezar awaz û ramûsan**
**û têl**
**dilê xwe ji pistepista bîranînê bi min dima**
**min te dîtibû**
**bi hemî bonga xwe**
**û ev nalîna   derketî**
**ji buhiştên xwedê di asoyê de**
**ev hemî**
**û hînê ez ji te hez dikim…**

# Nalîn

**Di nav xêzên min de**
**nalînek e**
**sihan nîgar dike**
**ji domahiyê re**
**û li ser dêma hêviyê**
**navnîşana xwe yê  berekirî**
**di nav piştçavên min de**
**pirtûkekî ji te re**
**jê bibe tiştê tu dixwazî**
**ji şîretên têpê**
**evîna min   nîgarbûyî ye**
**li ser dêma bendemanê**
**û tu hînê di malzaroka helbestê de**
**xwe bi agirê dûrketinê dişoyî**
**ji te hez dikim..**

# Dema em bûn

**Min jê re got**
**ev çi rê ye**
**mîna hirmîkîvarkê ye**
**dema ez wî dibînim**
**mîna sêwirê bi pêl dibe**
**dirame**

**got:**
**jê re strih û bîrêkirin**
**û di sînga wî de**
**xwezî û çîrok**

**û min got:**
**ti par ji axê re nîne**
**ku ne çiraya paş evînê be**
**dema evîn evîn bû**

**bi seyr e ev rê**
**û van nimêj**
**çendîn tişt bê robar şîn bûn**
**û çend sibeh  pêt bire rêya rast**
**û çend evîndar paş wî tevr bûn**

**ey ev bîrêkirin li bendê be**
**kesê lêketî lêxistibû**
**û yê li ser rêya evînê çû**
**tûbe kiribû**
**an bi bîrêkirin û azarî miribû**

# Giyana min tu yî

**Wek ezmanekî zelal**
**wek eyazekî tenik**
**henaseberdanên wê bi min derbas dibin**
**û bi dizî ve min ji bêdengiya wê re vedigerînim**
**wek maça perwînan ji gulan re**
**wek girnijînekê li ser rehniya heyvê**
**wek dînekê li min digere**
**dema bilmeziyê**
**ji min re  çûkan dişîne**
**berve têlên pencereya min**
**û bi hevdû re distrin**
**ji zaroktiya bi girî**
**dema sibehê…**
**şahî ji çavên wê**
**bi germahî li ser lêvê bîrêkirin min dixwe**
**û gotinekî ji çavên wê robaran diteqîne**
**di xêzên sirûştê de**
**dilê min ji nû ve gulgulî dibe**
**bi hena destön wê**
**ez zeviyên xwe rêdixînim**
**keskesorekê..**
**şîna xwe ji  derbasbûyan re dinivîsim**
**û dibişirim**
**wê ji jiyan bi te ciwatir bimîne**
**yara min**
**ji te hez dikim….**

# Nepenîbûna evînê

**Di nav rayekên stranê**
**û buhara helbest û pênosê de**
**te tînim bîra xwe…**

**min kêlîkê ji parkirinê rawestiyam**
**pişt re dûr çûm**
**ji lehiya helbestê**

**ta ez winda nebim**
**di nav xewin û narvînê**

**ji ber vê ma nepenî**
**di nav evîn û evînekê de**
**ez pêşbînîkirina nalînê dikolim**
**di nava bendemanê de yara min**
**ji te hez dikim..**

# Çavên te

**çavên te kaniyên reyhanê ne**
**çirûsîna mirar û murcanê  ne**
**ava zemzemê ne**
**mêrg û awaz in**
**rohilatina sibehê ne**
**şanişîna evîna min e  sirgunbûyî ne**
**reşiya welatê min in**
**daristan in   bi sindîganan ve cîteng bûn e**
**çavên te ez im**
**ezê ramanbûyî**
**di nav kelî û volkanê de**
**çi di te de ji zamrûtê**
**li ser giyanê min de bû lehî**
**dilo  aram be**
**ji te re ji evînê  gelek jiyangerî ne**
**ji vedenga temenê dilop bûn e**
**destanên rûmetê di rêyên felekê de**
**dilo aram be**
**ji çavên te ve hêviyek e tîrêjbûyî ye**
**navnîşana wê ewr in**
**û rêwiyekê li ser kevîka jiyanê**
**dê..**
**semageh amade bûye**
**bi zelaliya awazê**
**ma em kenê di ezmanê maçan de bibarînin**
**an xwe ji bîranînan re betewînin**
**ji me re  penage û ewlehî bûn**
**na.. nizanim**
**çavên te navnîşanek e ji dîrokek e windayî  re**
**ji te hez dikim**

# Ew deng bû

**deng bû**
**an dest bû**
**an parçeyek  henar bû**
**li vir ez bi volkanekî**
**şiyar nabim**
**û ne bi devê tifingê ve sax dibim**

**dûvmeqesk bilind dibin**
**li ser çiqlên hêviyê..**

**û ez miriyên perwînan amar dikim**
**di zîndanên bêhêviyê..**
**deriyê vê berêvarê lêdidim**
**dema aramiyê**

**ne qaz qirikên xwe ji derbasbûyan re badidin**
**li ser kenarên çemê..**

**û ne sêwî bi xelatên cejinê şad in**
**tenê ez di çiyê de bi cih bûme**
**ji  kedînk û  laşan**
**jê re domahîk heye…**

# Ji siha wê re perwînekê

**ji siha wê re perwînek e sipî ye**
**di taxa çilî di dilê min de dijîn**
**destê min bir**
**û di riwê wê de peyv in**
**ji min re gavên hevdîtinê nîgar dikin**
**dema solîn ji zelaliya xwe ye herdemî ve vedigere diraze**
**û di dilê wê de awaz in ji hevdîtina me re**
**li ser dengê bîrêkirin û xweziyan**
**ji te re kerneval**
**û hinek mey ji beravên helbestên min ve**
**tiyan av dide**
**li ser rêya bêçareyê…**

# Xwînçûyîna welêt

**ji welatekî ku bi bendemanê ve xwînçûyî dibe**
**êşên bîrêkirinê û   hayhoyên wê**
**û li ser axa giyanê**
**awaza xwebidawîkirinê   sazjen dike**
**xwîna min di lepê ê bê welat ve nîgar bûye**
**û leylana te**
**gulên xweziyên min av didin**
**carne**
**û hin caran ji hilma şehîdekî çêdike**
**zaroka xwe hini xwatir jê xwestibû**
**welatekî bi milyonên mizgîniyan ve bi cih bûye**
**sibe wê dem ji rebeniyê re nebe**
**û piştî sibe**
**ezê ji te re di dilên koçberan  de xewinan nîgar bikim**
**ezê xwe tevlî lêva helbestek e xemgîn bikim**
**heta ku bavê min ji temara xwe ya kûr ve şiyar be**
**û ji min re bêje:**
**were yara min**
**em bi tenê**
**xewin dikin ku em  sax bimînin**
**ne zêdetir..**

# Evîna dildaran

**Ne rok û ne heyv ji şewqên xwe bêzar dibin**
**û ne dûrketin  û têl ji ciwaniyê bêzar dibin**
**û ne evîn rojekê di dilên me de vemirî**
**û ne jiyan di lutkeya heyvê de bi dawî bû**
**û ne bedewbûn yê bi dû wê dikeve piştxwe dihêle**
**û ne şev diçe bê  şiyarbûn**
**lê sibeh yara min her roj tê**
**bê stûxwarî bê  tengezarî û birûsk**
**evîna dildaran di jiyanê de vedibe bi rûmetî**
**û   henas zelal evîn e û giyan durr e**
**û kenê te di dil de genimê şewq dide**
**wê çawa narvîn ji çirayê giyanê berhev bike**
**ne şev bê evîna te diyar dibe**
**û ne roj bi beşirînekê tê….**

# Bi tenê me ez

Bi tenê me ez
û bi tenê ye ev kernevalê lahotî
li ser lêva min e  reş

şekir bi min re nema
ta ez li ser barkiriyan re
li kolanên cengê belav bikim
hundirê bajêr
ew rêwî ne bê tirs

dîwar tenê nimêjan lidardixînin
xwatirxwestin li ser derbasbûnên wan de
di kêlîkan de
bêdengiyek  e di nav de hemî elfebayên heyînê
di cîhanê têne jêbirin
bê peyvek maf paş çavên ramanbûyî

ez ne li vir im
ta ez bi tenê di vê êvarê de bimrim
toza van salan hêdîka belav bûn
ne mîna gulekê bûn ta vebin
eger evîna vê buharê ne aniya jiyanê
mîna koşkekê
ez  her tiştî di hundirê xwe de dihêlim
min navnîşanên kesên yên di bîrê min de
bi zorê kolandin e xwendin
ey kesê paş axê derbasbûyî
emê rojên we

**li xwedê**
**li dawiyê de vegerînin**

**dengê xwe hinekî bide min**
**û vegere ezmana zaroktiyê**
**û hemî xewin û bêhêviyê bibe**
**ezê bi tenê piştî hemî wêraniyê namrim**

# Bese

**Bese**
**ji binefşekê ve**
**ronî tê**
**li ser lingên xwe digrî**
**û ev sêwir**
**tu tu ye**
**dema çinîna gulan**
**ji asoya peyvan de**
**ey bigiriyo**
**bi derbasbûna felekê**

**were bibe  bîner**
**bi xêzên stranan**
**dilovanî bi wê xweş hat rebeniya deştê**

**tu di deryarên xweziyan de  xwe dirêjkiriye**
**tu mîna qereçiyan  biyan î**
**û li ser  bermilekê ji welatekî bang li te dike**

**li vir bi cih bibe**
**li vie dil paş volkanekî  wekî te**
**nivistî ye..**

# Ji we hez dikim

**ji …**
**kesên jibîrbûyî yên li navnîşana min digerin**
**di cihê valahiya hov ji narvînê ve**
**ez ji we re dibêjim**
**ku ez li vir**
**li ser kevîkekê dijîm**
**rêyên westiyayî**
**ez mîna we li xwe digerim**
**henase min e derengketî mîna xewin û xweziyên we re**
**di qerebalixa vê mijê de yê me ji hev dûrxistibû**
**ji hemî wan aliyên xwe bi sertiya wê qelibî**
**li ser rûpakiya xweziyên me yên hatibûye gurandin**
**lanetên narvînê bes in ku deriya bêçareyê bikutin**
**ta ku em sax bimînin**
**xweşewîstên min**
**yên li min di nav tehtan de digerin**
**ji we hez dikim….**



* Rêber Hebûn (Rêber Adil Ehmed)
* Nivîskar, helbestvan û rexnegir
- Bi du zimanan berhemên xwe dinivîse Kurdî û Erebî
* Rojbûn: Munbic - Rojavayê Kurdistanê 02.11.1987
* Di zangoyê Helebê de beşê zimanê Erebî xwediye
* Pirtûkên wî yên  çapkirî :
- Qêrînên Roniyê, Helbest,   Erebî- 2016
- (Leylan û nerîn, deq û xwendin – Erebî 2017)
- (Komekên Kurdistanî, pexşan, Pexşan,(Hevbeş e bi pinar Kobanî re - erebî -2019)
- (Qêrînên roniyê , Helbest – Kurdî-2020)
– ji hevkirina simbûl  di romanên Helîm Yûsiv-rexne- Erebî 2020
**- Evîn hebûn e û hebûn zanîn e – raman- Erebî 2021**
**Rewrewkên xwînî – pexşan – 2021 Berlîn**
- Bi sedan gotarên wî  hene, li ser gelek malperên Elketronî û rojnameyên Kurdî û erebî de hatibûn e weşandin.

* Dameznerê malxaneya - Kombûna Zanyarên Azad-  a eleketronî  .

**https://reberhebun.blogspot.com/**
**reber.hebun@gmail.com**
**Whats app:004915750867809**

# Naverok


| | |
|---|---|
| **Diyarî** | |
| **Pêşgotin** | |
| **Keça sibehê** | |
| **Di aliyek e din** | |
| **Gup û ewrek î** | |
| **Berve bê** | |
| **Ji min pirsyar dike** | |
| **Gustîlkekê û qetek caw** | |
| **Xwîna min** | |
| **bendeman** | |
| **Di nerînên xwe de xwe rastgoyî bike** | |
| **Evîna kevinbûyî** | |
| **Ji te hez dikim û bêhtir** | |
| **Narvînek e rûçika min desdan dike** | |
| **Dem şikest** | |
| **Awaza evîndarekê** | |
| **Bi te diramim** | |
| **Girî** | |
| **Çar sîper** | |
| **Kobanî û ez** | |
| **Tu ji ku yî** | |
| **Vedengên êşê** | |
| **Koçber** | |

| | |
|---|---|
| **Li vir** | |
| **Ne kesek î** | |
| **çima** | |
| **Bîrê dike** | |
| **Perde distirin** | |
| **Ne ewr** | |
| **Çirûsînek î di buhara evînê de** | |
| **Dirêj e ew şev** | |
| **Ew havîn bû** | |
| **Awaza dilsoziyê** | |
| **Eynika çavan** | |
| **Şêran ey rehjenê min** | |
| **Destê min bi destên te ve** | |
| **Di nav lênûsên min de** | |
| **Ez ne li vir im** | |
| **Evîn û şoreşekê** | |
| **Germahî di çavan de ye** | |
| **Baran min dibe** | |
| **Mirinên du maçan** | |
| **Barkirin û tabloyekê** | |
| **Kefen distire** | |
| **Ferînaz Xisrewî** | |
| **Alanê kurdî** | |
| **Ew kefen bû** | |
| **Rehniya kesk** | |
| **Ey biyanî** | |

| | |
|---|---|
| **Bi te dikeve** | |
| **Çiraya şevê** | |
| **Ji te hez dikim** | |
| **Li paş rojê** | |
| **Pistepist û ewrekî** | |
| **Elfebayek e bala** | |
| **Dilopek av** | |
| **Şev û pend** | |
| **Bê evîn jiyan nabe** | |
| **Maç û bendemanê** | |
| **Serê xwe rake** | |
| **Şev** | |
| **Çavên min** | |
| **Şoreşa xwe lidarxistibû** | |
| **Kobanî** | |
| **Kurdistan warê lehengan** | |
| **Awzaek î mîna êşa min** | |
| **Dema berêvar hat** | |
| **Hevdîtinek di hembêza rokê** | |
| **Xewin distire** | |
| **Şev û şînên xwe** | |
| **Ey şev** | |
| **Ew baştirîn e** | |
| **Ey kevinarê** | |
| **Û çêdibe ku** | |
| **Sazjenî li ser bijangên çavên te** | |

| | |
|---|---|
| **Kêlî** | |
| **Êvar çirya** | |
| **Evînekê di min de dijî** | |
| **Yara min û hevdîtinê** | |
| **Xewin û evînekê** | |
| **arezû** | |
| **Dema em bûn** | |
| **Giyana min tu yî** | |
| **Nepeniya evînê** | |
| **Çavên te** | |
| **Deng bû** | |
| **Ji siha wê re perwînek ê** | |
| **Xwînçûyîna welêt** | |
| **Evîna dildaran** | |
| **Bi tenê me ez** | |
| **bese** | |
| **Ji we hez dikim** | |
| **Jiyangeriya werger** | |

ZANYAR

تجمع المعرفيين الأحرار

KOMBÛNA ZANYARÊN AZAD